Hevkarî HEVKARIYA HÊZÊN SIYASÎ YÊN KURD Û KURDISTANÎ LI SWÊDÊ
KURDISKA SAMORDNINGSKOMMITÉ I SVERIGE

Hevalên hêja,
amadevan û beşdarvanên vê roja xemgîn-wefata kekê me yê nemir Kerîmê Husamî,

Têkoşerekî bêhempa, nivîskar û rojnamevanekî berz, welatparêkî navdar ê Kurd, hevalê me hemûyan Kekê Kerîm ji nav me bar kir. Ew çira ya ku ji nîv çerxî zêdetir di nav tevger û doza Kurd de her ronahî da, vemirt. Ew pênûsa ku bi dehên salan, law û keçên welatê Kurdan, li ser doz û têkoşîna wan agahdar kirî, ew bi doza welatên wan re nêzîktir kirî, nenivîse. Ew zanayê ku em li ser gelek pirsgîrekên neteweyî-dîrok û têkoşîna kurdewarî ronî kirî, ne di nav me de be.

Em wî dengê, Kekê Kerîm li ser mîkrofonên radyonên Kurdî nebihîsin, bi awayek zindî rûyê wî yê bi ken li ser ekranên telewizyonên Kurdî hew bibînin. Di semîner, panel û şahiyên Kurd de, hew leqay wî werin. Em ji vê bexteweriyê bêpar man.

Wefata Kekê Kerîmê Husamî, dilê hemû Kurdan-ji Hewlêr heta Diyarbekrê, ji Qamişlo heta Mahabadê, tevayiya welatparêzên Kurdistanê, hemû rêxistin û sazûman ên Kurdistanê xemgîn kir.

Bizutina Kurd a neteweyî dê tu caran, xebata berfereh a Kekê Kerîm, li hemû aliyên Kurdistanê û di hemû qada tevgerê de, ku ewî ji pêncî salan zêdetir tê de cîh girt, jibîr neke. Herweha Kekê Kerîm sermayeyek berfereh ji bo tevgera Kurd hişt. Di dehên pirtukên xwe de, tecrube, agahdarî û zanayiya wî ya berz, dê rê li ber generasyonên nu yên neteweyê me veke, rêya wan ronê bike.

Li ser navê Hevkariya Hêzên Siyasî yên Kurdistanî li Swêdê-ez daxwaza sersaxiyê digihînim malbata Nemir Kekê Kerîm Husamî, dost û hevalên wî û tevayiya gelê Kurd.

Serê me hemûyan û yê gelê Kurd sax be...
Stokholm 2001 10 14

HEVKARIYA HÊZÊN SIYASÎ YÊN KURD Û KURDISTANÎ LI SWÊDÊ
KURDISKA SAMORDNINGSKOMMITÉ I SVERIGE:

PDK-IRAQ, PARTIYA KARÊ SERBIXWE YA KURDISTANÊ, HIZBÎ ñÛÎ YA KURDISTANA IRAQÊ, PDK-ÎRAN, HEVBENDIYA DEMOKRAT A KURD LI SURIYE (PDKP-S, PDK-EL PARTÎ, PHG-SURIYE, PÇK-SURIYE, PYDK-YEKÎTÎ-SURIYE), PDK-EL-PARTÎ-SURIYE, PSK, PDK-BAKUR, RSDK, PADEK, VEJÎN,